KURDISTAN

QENGÊ YEKITIYÊ

KOVARA YEKITIYA DEMOKRATÊN KURDISTAN

Rêxistina Qenciya Gelemper ya Pejirandî

Zeitschrift der Union der Demokraten Kurdistans
Gemeinnütziger Verein e.V.

Cengkarekî Kurd di navbera salên 1792-1798 de

Kurdischer Krieger mit spitzer Mütze, Holzschnitt nach G. A. Oliviers Reise durch das Türkische Reich, Egypten und Persien, während der Jahre 1792 bis 1798,,Bd. III, Wien 1809, zu S. 153.

Ji BO Serxwebûnê Di Eniyek Nîştimanî de Bighên Hev!

Sal:2/ 1984 Hêjmar: 3/4 Biha: 5,-DM

Hezar,hezar sed sal herin
Merd û namerd ser bigerin
Te bernadin em ji destan
Welatê me xweş Kurdistan

www.arsivakurdi.org

T Ê D A Y Î

Nivîsar	Nivîskar	Rûpel
-Ta Kînga ?.....	Hemreş Reşo	1
-Rewşa Me û Rewşa Dijminên Me	E. DERBAS.....	5
-Ewtonomiya Seddam H.....	Hemreş Reşo	12
-Ji Bo Çi ye Ev Giyanê Bê Hêvî	Heyderê OMER	19
-Rêzannameya Koma Doliwger a YDK 18/19.6.83....	....	24
-Biryarên Komcivîn a IV.....	....	31
-Kurd û Pirsiyariya Gelê Kurd Di Komcivîna 26 ya PKYS de	Tîmûrê Xelîl Muradov ...	34
-Helbestvanekî Kurd Li Rewanê	Tîmûrê Xelîl Muradov ...	35
-Ein Leser Brief	Abidin Sönmez	37
-Kurdische Institut in Paris	....	41
-Banga YDK ji Bo Alîkariya İnstitutê	....	45
-Parçe-Rojnameyên li ser Kurd nivisîne	....	46
-Pirtûkên Firotinê	....	51

Navnîşana Demî .....
Anschrift,zZ. .....

Y.D.K (U.D.K.)
P.F. 3219
D-4030 Ratingen 3

www.arsivakurdi.org

T A K Î N G A ?

"Ji bo ku em bikaribin xebata çandî bi hev re bikin, divê em bi kêmanî li ser dîtin, bîr û baweriyên siyasî bighên hev.
Bi a me, xebata çandî bê î naverokeke siyasî nabe." 10.1.1980

Ev herdu hevokên jorîn ji nameya berpirsiyarê rêxisteneke Kurd hatiye standin. A rast name bi xwe ye. Mehekê berî wê me civînek di navbera hin rêxistinên Kurd de pêk anîbû. Armanc ew bû ku di deqên hevpar de xebatek yekdestî were kirin... Di dawiya civînê de hate pejirandin ku bi kêmanî di warê çandî de (wek pêkanîna şevên kurdî,pîrozkirina cejna Newroz,çapkirina pirtûkên dîrokî û h.d.) divê tevgerek destpê bike... Lê wek di rêzikên jorîn de tête dîtin, ev jî, ji bo rêxistinên Kurd li Ewropa bi "yekbûna bîr û bawerî"ve dihate girêdan!...
Rêxistinên Kurd xwe di wê demê de gelekî bi hêz dinasîn û dixwestin ên derî xwe linav rakin an jî di nav xwe de bihelînin!..
Ewana bêtir meyîldarê hevcengîn û dijberiyê bûn. Hîmê rêzaniya xwe li ser derew, paşgotî û devavêtina hev danîbûn...

Gava merov bi çakî bala xwe bide van herdu rêzikên jorîn, merov dikare bi gengazî (hêsanî) rewşa "ronakbîrên" (entelektüel) gelê Kurd binase..

www.arsivakurdi.org

Berî her tiştî nezaniyek bê hempa têtе ber çavan:

1) Çand,hebûneke netewî ye û bûye malê gel. Di kevnariya dîrokê de dest bi pêkhatinê kiriye û ta roja îro dewlemendtir bûye û dê bêtir jî dewlemend bibe. Di pêkhatin û paraztina wê de her çînekî gel destekî pola dileyze. Destmiza (êmeg) her parçekî û her nifşekî gel tê de he ye. Jiber vê yekê jî gel bi giştî li çanda xwe dibane û lê dibe xwedî, ne tenê çînek an jî parçeyek ji wî...

2) Jiber ku çand hebûneke netewî (milli) ye,her nifşek ji netewe di paraztina wê de hevpar e. Ango gel parêzgerê çand e. Wek têtе zanîn ramana,an jî bîr û baweriya ku bi paraztina hebûnên gel û giyanê wî radibe, gelparêzî an jî welatparêzî (watanî, yurtsever) ye. Welatparêzî jî berjewendiya (menfeet) gel bi gelemperî (aam,umumî) dide ber çavan.

   Rizgariya gel û welatê wî ji mêtingehkaran û piştre jî paraztina serxwebûna wî û dewlemendiya welatê wî bingehê (hîm) armanca welatparêziyê pêk tîne. Jiber vê yekê jî hemû bîr û baweriyên çînparêzî jî hîmê ramana (îdeolojî) xwe li ser ramana welatparêziyê avêtine..

Di van herdu deqên jorîn de xweş têtе dîtin ku tevxebata çandî tucaran mercên (şertên) hevbîr û baweriyê û hevramaniyê di xwe de venaşêre, bi vacayî merovan bêgavî (mecburî) tevxebatê dike.

Kîjan bîr û bawerî an jî raman heye ku di tevxebata çandî de mercên gîhana hev di bîr û bawerî de dide pêş?

www.arsivakurdi.org

Kîjan bîr û bawerî heye ku tevpîrozkirina cejna Newroz an jî çapkirin û belavkirina Mem û Zîn bi mercên yekbûna bîr û bawerî ve girê dide? Ma gelo mafê kê an jî rêxistinê heye ku têdeyîya Mem û Zîn biguhêre?. Kî an çi vê bipejirîne û van mercan bide pêş, nezaniya xwe dide xûyanîkirin û bêvaciyek (ehmaqî) bê hempa ye...

Gava me bikaribûya "bi kêmanî li ser dîtin, bîr û baweriyên siyasî bighên hev", çima em nebûn yek rêxistin an jî nebin yek?? Ger ev merca "bi kêmanî" were cî, ma mercine din dimînin ku merov an jî rêxistin ji hev cuda bin an jî dûrî hev bimînin?..
Na, ev nameya jor raste rast û bi zaneyî û pozbilindî hatiye nivisîn. Jiber ku me di demek kurt de dît ku nivîskarê vê nameyê karî tevî rêxistina xwe bibe endamê "Federasyonê" li Siwêd! û bi nivîsarên xwe,di kovara Berbang de,piştgîriya tevxebata çandî jî dikir!..
Pêkhatina "Federasyonê" û ya "İnstituta Kurd li Paris" derewên gelek kesan di vê derbarê de derxistin ronahiyê.

Çima berpirsiyarê "Azadî, Kovara marksîst û lenînîstên Kurd" îro dikare bibe berpirsiyarê "İnstituta Kurd li Paris", ku hemu xebata xwe daye ser çanda kurdî, nivîskarê vê nameya jor nedikarî xebata çandî tev rêxistinek din bike?! Ger ne derewkarî ye, çima paşê piştgîriya vê xebatê kir û hêj dike jî?!...
Gelekî mixabin ku "ronakbîrên" Kurd ta niha negîhane bilindiya wê zanebûnê ku xwenas bin û baweriya xwe bi xwe û bi gelê xwe jî bihênin.

www.arsivakurdi.org

Jiber vê yekê ye ku hevnêzîkbûn an jî yekitiyên di navbera sazî û rêxistinên Kurd de pêk tên, bi tenê,bi destên biyaniyan (xelkê) çê dibin.
Gava karbidestên Siwêdî zor nedana rêxistinên Kurd, ew "Federasyon" jî pêk nedihat..
Gava Gaddafî an jî H.Es'ed zor nedana saziyên Kurd, ew hevhatin û pêkanîna "Eniya Niştimanî" jî çê nedibûn...

Lê weke bav û kalan gotiye: "Siwarê hespên xelkê,herdem peya dimîne". Ev e ku jiyana van celeb yekitiyana jî dirêj nake an jî dirêjiya jiyana wan bi berjewendiya biyaniyên ku di çêkirinê de destekî pola liztine têtе pîvan. Evana di demek kurt de ji hev bela dibin û neyartiya kevn bi tunekî germtir û hovtir destpêdike!
Ta kîngа dê gelê Kurd an jî endamên van sazî û rêxistinan ji vê rewşa kirêt re bibêjin "BES E!"? û dev ji van "pêşengên" xweperest,derewkar û fêlbaz berdin?
Ji van rastiyana çavgirtin, xinizî ye, birakujî ye û neyariya gel e.

Hemreş Reşo

www.arsivakurdi.org

REWŞA ME Û REWŞA DİJMİNÊN ME

Êrişa leşkerê faşîst ê Tirkiyê li ser Kurdistana Jêrîn û li ser tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurd, ji her alî ve gelek ders dide me;bi peyva rasttir, divê ku gelek dersan bide me. Lê belê,di vê nivîsarê de emê tenê yekê ji van dersan bigirin destê xwe. Ew jî mesela yekitiyê ye, mesela hevkarî û tevkariyê ye;yekitî û hevkarî û tevkariya Kurdan, yekitî û hevkarî û tevkariya dijminên Kurdan. Em berê li rewşa dijminan binêrin:

Herdu dewletên faşîst,ku yek ji wan dewleta Tirkan e, ya din jî dewleta Ereban e, bi hêsanî dikarin dijî gelê Kurd yek bin,leşkerên xwe bi ser sînorên navbera xwe re derbasî aliyê din bikin. Jibo ku vê yekitiyê pêkbînin,hevdîtina du wezîrên wan bes e;ku wextê wan teng be,dikarin bi hevdîtina sefîrê yekî ji xwe û wezîrekî dewleta din jî vê yekitî û hevkariyê pêkbînin. Piştî wê hevdîtinê êdî hemî rê li ber wan vekirîne, ew sînorên ku wan li ser axa Kurdistinê kişandine û wek sînorên navbera xwe qebûl kirine,ew jî li ser xerîtan dimînin. Leşkerê yekî ji wan, weke ku here herêmeke welatê xwe,wisa bi hêsanî derbasî aliyê din dibe.

Gelo çima yekitî û hevkarî û tevkariya dijmi-

www.arsivakurdi.org

nan weha hêsan e û weha bi lez û bez pêktê?

Jibo ku mirov bikare bersîva vê pirsiyarê bibîne,ne pêwîst e ku mirov pisporê siyasetê be, yan jî çend cild pirtûk li ser stratejiya leşkerî xwendibe. Bersîv,wek çiyayê Sîpan berçav e: Lewra ew herdu dewlet dijminên gelê Kurd in, tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurd jibo xwe tehluke û xetereke mişterek dibînin, jibo rakirin û tunekirina wê xeterê hemî maskên ku dane ber rûyên xwe bê şerm û fedî dikarin bavêjin,davêjin jî.

Yekitî û hevkarî û tevkariya dijminan dijî tevgera rizgarîxwaziya Kurd ne bûyereke nû ye.Êrişa leşkerê Tirkiyê li ser Kurdistana jêrîn jî, ne numûna pêşin e jibo hevkarî û tevkariya dijminan, dê ne numûna paşin be jî. Di dîroka gelê Kurd de gelek numûnên weha hene,gelek bûyerên weha qewimîne. Hevkariya Tirkiyê û Îranê dijî şoreşa Agiriyê sala 1929,êrişa du du firqe (tûmen) yên Suriyê li ser Kurdistana Îraqê û şerkirina wan dijî gelê Kurd sala 1963, îmzakirina peymana Cezayirê dijî gelê Kurd di navbera Îran û Îraqê de sala 1975,tenê çend ji fêkiyên tal ên hevkarî û tevkariya dijminan in

Wek me got: Xetera tevgera rizgarîxwaziya Kurd, hevkarî û tevkariya dijminên gelê Kurd mîna fir rek av hêsan dike,ew qet li vê yekê jî nanêrin

www.arsivakurdi.org

ku aliyek ji wan Tirk e, aliyek Fars e,aliyek jî Ereb e.

Rewşa dijminên Kurd ev e.

Em îcar li rewşa xwe, li rewşa Kurdan binêrin: Hemî komik û grupên Kurdan (biborin,"siyaset" ên Kurdan) dibêjin ku ew yekitî dixwazin.Lê yekitî û hevkarî û tevkarî wek teyrê Anqa ye,navê wê heye,lê ew bi xwe li ber çavan tuneye,jibo peydakirina wê jî xebateke weha ji dil û berdar (verimli) nayê kirin. Gişt dibêjin ku ew ji bo azadî û rizgariya Kurdistanê dixebitin.Lê belê,doza azadî û rizgariya Kurdistanê jibo yekitiyê bes nabînin. Yek meseleke "teorîk",jibo dûrketina wan ji hev bes e û pirr e jî.Mesela pêwendiyên feodalkî ne? Ev dibe sebebeke "giring" jibo ku "siyaset"ên Kurd nebin yek. Mesela cunta leşkerî ya Tirkiyê faşîst e,yan na? Ev jî jibo "siyaset"ên me sebebeke "bingehî"ye ku ji hev cuda bimînin û ji hev dûr bikevin, dûr bisekinin..

Yanê dijminiya gelê Kurd û xetera tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurd çawa dikare bi hêsanî dewleta Tirkan û ya Ereban û Farisan li dora xwe bicivîne û hêzên wan bike yek, hevkarî û tevkarî di nava wan de pêkbîne;cudayiya dîtinan li ser hin meselên "teorîk" jî wisa dikare bi hêsanî hêzên Kurdan ji hev cuda bike. Dike jî.

Dijmin bi pratîkî dixebitin û karê xwe dikin,

www.arsivakurdi.org

çawa bikarin tevgera rizgarîxwaziya Kurd biperçiqînin,wisa dixebitin;jibo gîhana vê amancê kîjan rê ji wan re dest bide di wê rê de dimeşin. Lê belê, hêzên Kurdan guh nadin pratîkê;jibo wan tiştê giringtirîn "teorî"ye.Bi peyveke din, meydana pratîkê ji dijminan re hiştine û ew bi xwe ketine meydana "teorî" yê,li wir "jibo rizgariya Kurdistanê" dixebitin..

Hin kes,jibo ku vê rewşê mazûr binimînin weha dibêjin:

"Ev parçebûn ne tenê li nav Kurdan heye. Rewşa komik û grupên Tirkan ji ya me xirabtir e. Ew jî bûne deh parçe û hin ji wan jî şerê hev dikin".

Ev dîtin,ne dîtineke maqûl e, ne jî rast e.Hêzên Kurdan nikarin bi çavê komik û grupên Tirkan li xwe binêrin û berpirsiyariya xwe ewqas biçûk bikin;her weha nikarin û heqê wan jî tune ku doza rizgarîxwaziya welatekî dagirkirî û gelekî bindest, bînin bidin ber xebata hin komikên welatekî xweser,ku her yek ji wan komikan xwediyê çend sed an jî çend hezar endamî ye.Rast e ku komik û grupên Tirkan jî bi vê parçebûna xwe nikarin bigêhin derekê. Lê ku negihênê jî, netewê wan û welatê wan tiştekî pirr mezin winda nake. Lewra welatê wan,welatekî xweser e,dewleta wan heye û sînorên wan kişandî ne.Ma doza wan ev e? Em hemî dizanin ku dijmin,bi taybetî

www.arsivakurdi.org

jî dewleta Tirkiyê,bi hemî îmkanên xwe dixebite ku gelê Kurd di nava Tirkan de bipişêve (asîmîle bike) û tuneyî bike. Jibo gîhana vê amancê hêzên xwe gişt seberber kirine.Qîma xwe bi vê yekê jî nahêne;300 hezar eskerên xwe li Kurdistanê bi cî kirine. Qîma xwe bi vê yekê jî nahêne;dema ku bêhna xeterekê ji hêleke din a Kurdistanê bigire, bi zîhniyeta Cengîz û Hulagû êrişî ser wê hêlê dike.

Dema ku mirov ji vî alî ve li meselê binêre,mirov bi hêsanî têdigihê ku doza Kurdistanê bi doz û xebata komik û grupên Tirkan re nayê qiyaskirin, tewr qiyas qebûl jî nake. Eger qiyasek pêwîst be, divê ku mirov doza gelê Kurd bi hêzên leşkerî yên dijmin re qiyas bike. Em dibînin ku 300 hezar leşkerê dewleta Tirkiyê li Kurdistanê ne,bi top û tang û firokeyên xwe ve,bi her tewir çekên xwe yên sivik û giran ve li ser sînga welêt danişti-ne. Di nava wan de qet dubenditî û "cudayiya dî-tinan li ser meselên teorîk"jî tune. Hemî bi emr û ferman û disîplîn tev digerin.

Li gora vê rastiyê,divê ku hêzên Kurd jî têbigi-hên ku giringî û giraniya doza Kurdistanê li gora giringî û giraniya hêzên dijmin e,ne ku li gora xebat û rewşa çend komik û grupên Tirkan e ku her yek ji wan xwediyê çend sed an jî çend hezar en-damî ye. Her weha,berpirsiyariya hêzên Kurd jî li gora giringî û giraniya doza Kurdistanê ye. Çawa

www.arsivakurdi.org

ku leşkerê dijmin bi yekitî û emr û ferman û disîplîn dijî gelê Kurd rawesta ye,divê ku hêzên Kurd jî bi wî çavî li xwe binêrin û xwe di binê berpirsiyariyeke wisa giring û giran de bibînin û li gora wê birpirsiyariyê jî xwe amade bikin. Ev jî,bi civîna hemî hêzên azadîxwaz û rizgarîxwaz li dora xebateke merkezî dibe,bi peyveke din bi "yekkirina hêzan" pêktê.

Heqê her Kurdekî ye ku bipirse:

Çima Tirk û Ereb dikarin dijî gelê Kurd û jibo tunekirina gelê Kurd dibin yek,çima Kurd û Kurd nikarin dijî dijminên xwe û jibo paraztina hebûna xwe bibin yek?

Peyveke Tirkan heye,weha dibêje: "Bir musibet bin nasihatten yeğdir". Yanê "yek felaketek ji hezar şîretî çêtir e".

Hatina cunta faşîst li Tirkiyê bo karînê,jibo gelê Kurd bû felaketeke mezin.Ji wê felaketê ders û tecrube nehat girtin,jibo yekitiyê ew felaket nebû şîretekê jî, bi qasî şîretekê jî hişê hêzên Kurd neanî serê wan. Hevkarî û tevkariya tirkiyê û İraqê dijî gelê Kurd û êrişa leşkerê faşîst ê Tirkiyê li ser Kurdistana Jêrîn jî bû felaketeke din. Lê wisa xuya ye ku ew jî jibo yekitiyê nebû ders û tecrube,wê jî bi qasî şîretekê jî hişê hêzên Kurd neanî serê wan. Îcar, ma ne heqê her Kurdekî ye ku bipirse:

Gelî hêz û komik û "siyaset"ên me! Gelo hun li

www.arsivekurdi.org

benda çi ne ku hun xwe bikin yek? Jibo ku hişê we were serê we û hun giringiya yekitiyê bibînin, gelo hun li hêviya çend felaketên dî ne? Hun di kovar û rojnameyên xwe de dinivîsin ku "emê faşîzmê biperçiqînin", "çiyayên me dê ji leşkerê Tirk re bibin goristan". Ev gotinên xweş in. Lê ji kerema xwe destûr bidin ku em jî ji we bipirsin:

Gelo bi kîjan hêz hunê faşîzmê biperçiqçınin?

Gelo bi kîjan hêz hunê çiyayên me ji leşkerê Tirk re bikin goristan?

Gelo we peyva pêşiyan a kurdî nebihîstiye ku dibêje "Kirinek ji hezar gotinî çêtir e"?

Eger we nebihîstiye em tînin bîra we:

Belê, "Kirinek ji hezar gotinî çêtir e".

Her weha em tînin bîra we ku, gîhaneka pêşîn li ser reya azadî û rizgariya Kurdistanê,navê xwe "YEKÎTÎ" ye.

E. DERBAS

www.arsivakurdi.org

"Ewtonomiya Saddam Husên"

Gotina "Autonomie" ji zimanê yunanî hatiye girtin û xwebêja (maneya) wê jî "Xwedûzanî" an "Xwe-dûzanpêkanîn" e. Herçend ku fileyên (îsayî) protestant gotina "Autonomie" dijî girêdana bi dêra katolîkî ve û Kant jî ji bo girêdana totik (aqil), vîn (îrade) û sinçî (ehlaq) bikaraniye jî, giringiya vê gotinê di dema pêkhatina dûgelên (dewlet) netewî (mîllî) de li Ewropa xwe dida xûyanîkirin.Borjuwayên ewropayî ev gotin dijî parçebûna gelan di bin nîrê derebegiyê de ji bo serxwebûnê bikartanîn. Bi kurtî xwebêja gotina "Ewtonomie" di wê demê de wek xwebêja "mafê çarenûsa gelan" ya îro dihate naskirin û zanîn. Em dikarin bibêjin ku di wê demê de "Autonomie" raste-rast "Serxwebûn" dihate naskirin,ne weke "mafê çarenûsa gelan" ku dikare sînorên xwe teng bibe..

Lê îro sînorên vê gotinê hatiye tengkirin û bi sînorên dûgelan ve hatiye girêdan. Gava gelên bindest armanca "Autonomie" didin ber xwe, bi vê kirê daxwaza tevjiyanê jî dipejirînin (qebul dikin). Bi vê yekê, bi xwe, reya cudabûnê, ango reya serxwebûnê ji xwe digrin û destên biratiyê dirêjî zordar û zînatkarên xwe dikin. Ango, bi kurtî, xwe "davêjin bextê" wan. Dibêjin:" Em birayên we yên biçûk in,em doza mafên merovî, yên xwezayî (tebîî) dikin"!

Wek têtе dîtin, di vir de lavakirin (bergerîn) û pêşkeşkirina daxwazan destekî pola dileyzin. Di vê dozkirinê de ciyê gefxwarinê (tehdît) tuneye. Ji bo bicîhanina vê daxwaz û armancê doz û têkoşîna gelê bindest bi tenê têr nake,divê

www.arsivakurdi.org

gelê serdest jî qîma xwe pê bihêne û destên biratî dirêjî gelê bindest bike. Ger na, gelên bindest bêgavî (mecburî) gefxwarinê dibin û doza cudabûnê didin xûyanîkirin, bi kurtî, ala serxwebûnê hildidin û ji bo vê armancê dicengin. Ev gavavêtina duhemîn, bi tenê, li ser reya cenga çekdarî dikare were kirin...

Wek me berê jî dabû ber çavan: Em ne bawer in ku bi cenga çekdarî mafên "Autonomie" dikarin werin standin! Di warê "Autonomie" de dilsoziya tevjiyana biratî, ya destbirakî û hevparî gelekî giring e. Ger na, mafê ku bi destezorî bête standin, divê bi destezorî jî were paraztin! Ev paraztina destezorî jî tucaran piştî standina maf,bi xwe carek din xistina nav lepên neyar, nayête pêkanîn!

Gava em "Komara Mahabad" di sala 1946 de û "Autonomie"yên Kurdistana Nîvro di salên 1922 de "Şêx Mehmud) û di 11.3. 1970 de bînin ber çavan, ev rastiya dilêş bi hêsanî têtе dîtin. Berî her tiştî, "Autonomie" ji bo gelên bindest, yên ku bi giştî di nav sînorên dûgelekî de dijîn pere dike. Lê ji bo gelê Kurd,ku di nav çar dûgelan de hatiye parvekirin,ev daxwaz û pêkanîna wê her û her di bin metirsiyê (xeter) de ye. Em bipejirînin ku yekek ji van dûgelên ku gelê Kurd bindest kiriye ev daxwaz anî cî, ma gelo ev ne hevn e ku em bawer bikin dûgelên din dê çavên xwe li ber vê bûyerê bigrin? Gava ewana bê çavtengî temaşeyî vê bûyerê bikin, xwebêja xwe ew e ku ewana jî amadeyî naskirin û dayîna mafên gelê Kurd in! Ma di roja îro de ev merovî, xwenasî û zanîn di wan de heye? Kî bawer dike ku riçperestên kemalîst, ku hêj hebûna gelê Kurd napejirînin,dê

www.arsivakurdi.org

bi hêsanî (gengazî) vê hebûna berçav (objektîv) bibînin û bikaribin mêjiyên xwe yên genî ji pasikiyê paqij bikin?..

Gava em îro rewşa parçe Kurdistanan didin ber çavên xwe,em dibînin ku di du parçe Kurdistanan de cenga çekdarî,ya germ ji bo armanca "Autonomie" an "Xudmuxtarî" domdar e... Pêşengên parçe Kurdistanan bajarê Şamê ji xwe re kirine keleha azadiyê û xwe spartine zordarên Kurdistana-Navîn!! Zû hatiye bîrakirin ku di sala 1964 de leşkerên Surî êrişî Pêşmerge kirin! Zû teye bîrakirin ku leşkerê Tirk par êrişî Pêşmerge kir û ta îro jî mêldarê êrişkirinê ye...

Me li jor jî got: Ji bo pêkhatina ewtonomî dilsozî û daxwaza herdu aliyan pêwîst e. Jiber vê yekê jî li herdu parçe Kurdistanan armanca"ewtonomî"bi armanca anîna"demokratî" ve hatiye girêdan. Em vê yekê rast dibînin. Em jî bawer in ku, ger "Demokratî" bikaribe were nav van welatan, cî anîna daxwazên gelê Kurd ya ewtonomî jî hêsantir dibe. Lê gava em bûyer û nûçeyên van çend mehên bihorî didin ber çavan, em dibînin ku hêzekî ji hêzên Kurdistanî dev ji vê armancê - merca hatina demokratî- berdaye û xwe bi koreyî avêtiye hembêza mêrkujê gelê Kurd, Seddam Husên! A rast, Seddam ne tenê mêrkuj e, ew di xortaniya xwe de jî mêrkuj bû, lê ya rasttir ew gelkuj e, merovekî har û hov e..

Ma ew ne Seddam bi xwe bû ku binnivîsa (îmza) xwe bi şadimanî xiste bin hevhatina 11.3.1970 û paşê jî ji bo xirakirina wê di 6.3.1975 de li bajarê Cezayîr destê xwe da Şahê xwûnmêj! Û ma dîsa ne ew Seddam bû ku berî 41 mehan ew hevhatina ligel Şah jî linav rakir, bû ûşta cenga mirin û mayîna gelên îranî û iraqî?! Ku bi sedhezaran merov

www.arsivakurdi.org

têtе kuştin û aboriya herdu welatan teye tar û mar kirin!
Merov divê carekê bala xwe bide pirtûka wî "Une Tranchée Commune ou Deux Tranchée Opposées?,Sartec Lausanne,Er-Rachid- Baghdad."
Di rûpela 37 de Seddam dibêje: "Divê em du kelemên mezin bidin ber lingên neyaran û wan kesên ku doza cudabûnê dikin. Yekek ji wan li ser reya "moral"e. Bi vê reyê divê em gelê xwe li Kurdistan baş têbigêhînin ku çarenûsa (qeder) wan bi tewawî bi yekitiya İraq ve girêdayî ye...
Ya duhemîn jî ew e ku reya dîzanî,rêzanî û leşkerî were bikaranîn..."!!
Di rûpela 38 de jî: "Wekî din divê em li ser dirêjiya sînor kembereke 20 Km fireh ji rûniştvanan (nufus) vala bikin û leşker tê de bi cî bikin..."

Seddam di vir de bi kurtî dibêjê: "An Kurdê qîma xwe bi helandina (asîmîlasyon)di nav İraqê de bihênin, an jî emê wan linav rakin!"

Em bawer in ku divê ev rastiyên li jor hatî hêjmartin çavên her Kurdekî bikaribin vekin û di her gavavêtinek rêzanî de bikaribin bidin ber çavan...
Lê gelekî mixabin, em dibînin ku hin pêşengên "Yekitiya Niştimanî" van rastiyên han nadin ber çavan û dixwazin dîsan bibin hevalbendên Seddam Hesên!
Em dibêjin"gelekî mixabin", jiber ku serpêhatiyên Celal Talabanî û hevalên wî ligel Partiya Bees û Seddam Husên ji hêzên din bêtir e. Jiber ku hindik mabûbû ku gelê Kurd

www.arsivakurdi.org

wê rûreşiya wan, ya di sala 1966 de bîra bike û wan di nav rêza welatparêzên Kurd de binase! Her waha di dîraka gelan de tucaran nehatiye dîtin ku xiniz careke din bikaribin hefsarê gel têxin destên xwe ji gel re bibin pêşeng! Lê gelê Kurd di vê rewşa xwe de hewceyî her "ronakbîrekî" ye...

Di sala 1966 de jî wan xwe avêtibûn hembêza karbidestên iraqî û di 29.6.66 de jî hevhatinek 12 deqî ligel wan hatibû çêkirin... Lê gava hate dîtin ku bi vê jî gelê Kurd piştgîriya Celal û hevalên wî nake, karbidestên iraqî ew hevhatin ligel şoreşê pêkanîn! Dîsa divyabû Celal sala 1970 bihaniya bîra xwe: Gava hevhatina 11.3.1970 pêk hat, Seddam dev ji hevaliya wî berda, ew li rastê hişt û ciyê ku tê de bireviya nehişt. Dîsa Şoreşê hembêza xwe ji wan re vekir!..

Ma gelo ji van bûyeran brîndartir û dilêştir serpêhatî hene ku bikaribin çavên Celal û hevalên wî vekin?..

Wek têtе zanîn, li Kurdistana Nîvro (Îraq) du Enî (cephe) hebûn: CUD û CEWQED."Yekitiya Nîştimanî" di bin serektiya Celal de di nav CEWQED de ciyê xwe girtibû. Wek têtе xûyanîkirin,hemu rêxistinên ku di CEWQED de ciyê xwe girtibûn dijî vê hevhatina Talabanî radiwestin. Ya giringtir ew e ku rêxistinên ku di nav "Yekitiya Nîştimanî" de ciyê xwe girtibûn jî dijî vê hevhatinê radiwestin. Ji wan yek "Komela Rencberan" e ku vê hevhatinê xinizî (xiyanet" dinase û dide xûyanîkirin!.. Bi kurtî Celal û hevalên wî dîsa bi tenê mane û ketine nav hembêza çavsorên Beesî!..

www.arsivakurdi.org

Gava ewana bawer in ku dê bikaribin bi alîkariya 4o ooo serbazên iraqî pişta gelê Kurd û iraqiyên dij-Beesî bişkênînin, ewana xwe dixapînin. Ji sala 1966 ta dawiya 1969 jî karbidestên iraqî bi heravayî alîkariya wan kir û nêzîkî 6o ooo caş jî bûbûn hevalbendên wan! Lê wan nedikarî xwe li hember 2o ooo Pêşmerge bigrin û dawî di sala 1970 de bêgav (mecbur) bûn ku xwe bavêjin bextê Şoreşê...

Em dev ji serpêhatiyên hîndar (dersdar) berdin, ma gelo pêşengên "Yekitiya Niştimanî" gotin û nivîsarên xwe jî ji bîra birine?"Yekitiya Niştimanî", di meha yekan,sala 1983 de, di rojnama xwe "Yekitî" de: "Seddam xwe nêzîkî gelê Kurd dikê... Ew dixwazê dongiya (netice) ku bi cenga linavrakirinê û zînatê nikaribû dest xwe bêxîne, li ser reya fêlbaziyê (hîle) destkewtî bibe.. Ma wî (Seddam) bîra kir an jî bîra dike ku wî çend zînat (zulm),malkambaxî û boblat ji İraq re anî... Her hêzekî ku qîma xwe bi vê nêzîkbûna Seddam bihêne, têkoşîna dijî vî nîrê faşîst berde,bibe parêzgerê wî û di karbidestiyê de bibe hevpar, xwe dişewitîne û ji gel dûr dikeve... Yek Rê Heye, Ew Jî Hilweşandina Dîktatoriyê û Anîna Demokrasiyê ye."
Kanê armanca anîna "demokrasiyê di vê hevhatina ku dixwazin çê bikin? Ma bi mayîna Seddam dikare "Demokrasî" were nav welêt?...
Dîsan "Yekitiya Niştimanî" di rojnama "Alxerac Al-Huriyet" de,di 10.8.1983 de bi nameyekê dide xûyanîkirin ku:"Yekitiya Niştimanî tevxebata bi faşîstan (Bees) re xiniziyek niştimanî (xiyeneta watanî) dizane. Ev tevxebat di bin kî-

www.arsivekurdi.org

jan perdê de dibe bila bibe û dongiya wê jî çi dibe bila bibe, kî vê dixwaze bike,dê hem rêzanî û hem jî civakî bikeve"!!

Di van herdu nivîsarên jorin de jî gelekî xweş û vekirî ye ku pêşengên "Yekitiya Niştimanî" bi çakî Seddam dinasin û dizanin ku Seddam Husên ne merovekî ku pê were bawer kirinê ye. Ger waha ye, ma gelo êdî kes dikare ji vê komikê re rûçikekî paqij bigere û peyda bike? Na, ewana,wek berê,bi zaneyî reya xiniziyê didine ber xwe û tê de dimeşin....

Di sala 1967 de min helbestek di bin navê "Pêşmerge" de li ser van celeb merovana nivisîbû. Ew helbest bi van rêzikên jêrîn kutayî dihat:

"Ew kesên ku bûne Caş, Noker û "Fursan"
Dane ser milên xwe, ew kurtanê keran
Li wan pîroz be, bila bikşînin baran
Lê divê bîrnekin her, wan "Hersê daran"
Da bibin "Poxlî Şehîd",wek hemu caran!"

Bê guman, dongiya yên ku hevaliya Seddam bikin,dijî gelên iraqî,bi Kurd û Ereb,rabin,"Sê Dar"in û di dîroka Kurdistan de jî dê bi navê "Poxlî Şehîd" werin navkirin.

Hemreş R.

www.arsivakurdi.org

JÎ BO ÇÎ YE EV GÎYANA BÊ HEVÎ??

"Çima ez dîn im?". Di bin vê navnîşanê de birader "Zoro Mettînî" helbestek nivisiye. Di rûpela 33 an,ji hêjmara yekemîn,ji kovara "Dengê Yekitiyê", ez bi wê helbestê re mujûl bûm..
Berî nêrîn û xwendina xwe li ser wê helbestê pêşkeş bikim, dixwazim çend peyvokan bêjim,hêvîdar im ku ew bibin têxistinek ji bo xwendina "Çima ez dîn im".
Ger em bawer bikin ku 2 rûyên jînê hene,bê guman em dikarin bizanibin ku rûyek jê aborî-rêzanî ye, û yê din jî civakî ye, û bandora (tesîr)herdu rûyan li hev bi germîn û giranî heye. Û ji ber ku tore rengeke ji rengên dan û standinê di navbera gel de ye, em dikarin bibêjin: Ew hevbandora her du rûyên jînê (Aborî-rêzanî û civakî) dibe dayîka tore,ango tore berbanga jînê ye. Ev rastiya nahêle -yek car- dûrî jîna Kurdistan em bi toreyê Kurdî re bidin û bistînin.
Em gişt dizanin jîna Kurdistanê, bi her du rûyên xwe çi ye.. Kedxwarî,bindestî,zordarî,belengazî... Û di bin van navnîşanan de jî gelek tiştên hovitî,yên ku karbidestiyên dijmin roj bi roj pêktînin,ji me ve xûya dikin. Lê belê li hember ve jîna tehl û dijwar şiyarbûneke rêzanî(netewî û sosyalîstî),bi germî û giranî,serê xwe hildaye û navê Kurd û Kurdistan,yên ku xwînmijan ji gelek sal

www.arsivakurdi.org

de bo wendakirina wan xebitîne,li çar aliyên cîhanê têxistine guhên her kesekî,û bi wan dane zanîn ku Kurdistan bombek e û dema teqandina wê bombê dê bê. A niha jî gavên li Kurdistanê tên avêtin didin zanîn ku ew dema roj bi roj dê nêzîk bibe...

Ev e-bi kurtî-rewşa îro li Kurdistanê em dibînin, ger tore jî rast be,kurrê jînê be,tore yê gel be, divê dengê vê rewşa han di navbera peyv û gotinên wî re em guhdar bikin..

Ger em bizivirin ser helbesta birader "Mettînî", em dibînin di destpêkê de dibêje: "EZ;..",ev jî destpêkek baş e di toreyê rêzaniya teze (nû) de, ji ber ku carekê hatiye zanîn ku dema torevan (nivîskar) bi dengê merovtî "Ez" dipeyive,ew xwe têdixe ciyê gel,ango "Ez" di toreyê rêzaniya teze de "Em" e..

Di navbera rêza yekemîn re xûya ye ev helbesta bersîva pirsekê ye,kesina ji wî pirsîne: Tu dîn î?,an jî ji xwe re pirseke wilo danî û bersîv jî da. Çi got? Bi qêrîn û yek deng got:"Na..",ango ew ne dîn e...

Ger em vegerin zimên û li peyvoka "Dîn" bipirsin, sînorên wê ji kêmasiya mêjî derbas nabin,ji ber vê yekê dema helbestvanê me ew peyvoka ji xwe ve dûr avêt, em gelekî kêfxweş bûn. Lê mixabin kêfxweşiya me ber dewam nebû,ji ber ku ew merova vegerî û di parçê duwem de got:

www.arsivakurdi.org

"Ez dîn im,lê dînê welêt im,
Ez dîn im,lê tev agir û pêt im."

Em şît-mît man,çawa merovê "Dîn" dê bizanibe welat çi ye?. Çawa merovê "Dîn" dê di doza welatan de bibe "agir û pêt"?. Ma carina kesekî navên merovên "Dîn" di rûpelên dîroka gelan de dîtine? Eger helbestvanê me ji hezkirina gelê xwe gîhaye "Dînbûn"ê,dîsan em wê yekê rast nabînin,ji ber ku kesên xebatkar,têkoşer û şoreşger "Dîn" nabin û li pêş çavên wan reşbûn xûya nake.Helbestvanê me dibêje:

"Reşbûn li ber çavên min xûya ye."

Ew "Dînbûn"a ji xwe re pêşeng girtî û li dû çû ye,ta gîhaye reşbûn û tariyê û wê reşbûnê sînorin gelek kûr û fireh têxistin orta wî û zanîna rêka rast. Hêviya di çavên zarokên Kurd de dikene ne xûya ye,bawera di dilên gel û peşmergên Kurd de hildipijiqe ne xûya ye,tenê reşbûn xûya ye.. Çiqas nêrînek reş û bê hêvî ye!!..

Me ev gotinan ne ji mêjiyê xwe anîne,her kesek hêdî-hêdî bi "Çima Ez Dîn im?" re mujûl bibe dê bigêhe vê rastiyê. Em dixwazin bipirsin: Ma pêwestiya vê nêrîna reş û tarî çi ye? Pêwestiya wê-ger helbestvan dizane û ger jî nizane- tenê belavkirin û weşandina giyaneke sist di navbera gelê me de ye, tenê kuştina hêviya Kurd e,tenê valakirina baweriya Kurd e, tenê kolandina gora Kurdistanê ye...

www.arsivakurdi.org

Divê torevan,helbestvan û nivîskar tiliyên xwe bidin ser ciyên şaş û nexweş di rewşa gel de, divê wan ciyên nexweş bi rengekî gelek genî bidin pêş çavên gel. Lê divê di dû re nêrîna rast jî pêşkeş bikin,bo gel şiyar bibe û bi rastiyê bizanibe û ji ber vê bixebite,ne tenê ji gel re bibêjin:

"Fîşeka me gîha sînorê xewê,
cenga me bû ji bajarê Çîroka."

Eger parçebûna tevgera Kurdistanê "Mettînî" gîhandiye vê nêrîna tarî û vê giyana bê hêvî,dîsa -ji aliyên rêzanî,dîrokî û îdyolojî-em nêrîna wî merovî rast nabînin,ji ber ku parçebûna tevgereke wek ya Kurdistanê tucaran nabe sedemek(sebeb) ji hebûna nêrînên reş,bê hêvî û bê bawer,di qaf û mêjiyê kesekî de,ev nêrîna nexweşî ye,em dikarin jê re bibêjin "kurt nêrîn",ji ber ku hebûna gelek qatên civakî (karker,cotkar û gundî,xwendevanên ronak û burjuvaziya biçûk) hebûna partiyekê an jî duduyan rast nabîne. Divê partî hebin, lê divê hevpeyvîn û dan û standin di navbera wan de hebe,ta bigêhin Komcivîn,Kongireke nîştimanî û ji wê kongrê jî Eniyek nîştimanî bête hilbijartin, bo gavên hêja di qada xebata netewî û civikî (sosyalîstî)bêtin ajotin. Ev e-wek ez dibînim nêrîna ku divê li nav gelê Kurd bête weşandin û her kesên xwe gelparêz,demokrat û şoreşger dibînin divê ji bo vê nêrîn û daxwaza gelêrî û niş-

www.arsivekurdi.org

timanî bi germî bixebitin,ne wek Mettînî" em bibêjin:

"Felek çîroka min bibe ser ba,
Û li cîhanê gişî bigerîni."

"Felek" tucaran barê gelan hilnade ser milên xwe. Axa Kurdistan bi xwîna gelê me têtе avdan,çawa emê bizivirin sedsalên navîn û bang bikin,"Felek çîroka me li cîhanê bigerîn"?....

Li dawiyê hêvîdar im ku ev gotar û xwendina min nête têxistin bin dan û standina merovtî,jiber ku ez sedî sed bawer im ku ji bo paraztina toreyê kurdî û şiyarbûna gelê Kurd li ser reka rast min ev gava avêt,jiber ku tevî dijwartiya ser toreyê me,torevanên Kurd ji "Hemedanî,Xanî û Feqehê Teyran" de heya "Goran,Cegerxwîn û Osman Sebrî" bi rûmetî cihê xwe di nav gelê Kurd û toreyên gelên biyanî dagirtine. Divê xwendevan û torevanên teze vê serbilindiya toreyê me biparêzin û baş bizanibin ku pêwestiya tore di jîna gelan de çî ye û baş guhên xwe bidin gotina generalê Firensa "Napolyon Bonapard" dema wî digot: "Ez ji hezar tangî û ji hezar leşkerî natirsim,lê gotareke rojnameyekê min ditirsîne." Ev gotina berî du sed sal wî generalî gotibû, îro jî dîsan wilo têtе gotin.. Nivîskarê Misirê "Ûsif Îdrîs" carekê destûra çûyîna Emerîka ji rêwî (sefîr,konsul) xwest,lê deh roj bihorîn û rêwî bersîv neda, wê demê ew nivîskara çû rêwîgeha Emerîka û ji rêwî re got: "Çima hûn destûra min nadin,tevî ku kesên "komonîst" di rojekê de destûrê digrin?" (Nivîskar komonîst e),rêwî bersîv da û got: "Nivîskar û torevan ne wek kesên rêzanî (siyasî) ne"....

Heyder ê Omer

www.arsivakurdi.org

RÊZANNAMEYA KOMA DOLİWGER A YEKİTİYA DEMOKRATÊN KURDİSTAN Jİ BONA KOMCİVÎNA ÇAREMÎN 18/19.6.1983

Mêvanên bi rêz!

Heval û hogirên hêja!

Bi navê Koma Navînde û Koma Doliwger xêrhatina we dikim. Bi hatina we em gelekî serbilind û serfiraz bûn.

Birayên delal!

Îro li nik zînat,mêtinkarî,pelçiqandin û kuştina gelên bindest,çelqîn û lerzînek nû ketiye nav gelên cîhanê.Ev lerzîn û çelqîna ku îro dikarê bi mîlyonan kes bikşîne ser şeqem,kolan û meydanan ji tirsa ku metirsiyên çekên nûjen,ên atomî di xwe de vedişêrin teye. Ev tevgera bi hêz û hêvîdar di nav gelên serdest de destpêkir.Ev tevgera aşitiyê,tevgera dij-çekdariyê ye.Hêdî hêdî teye nasîn ku ev çekên nûjen,ên atomî dê rojek ji rojan li wan vegerin,gel û welatên wan jî ser û bin bikin û li serê wan bibin boblatek mezin! Ev nasînaye ku îro bi hezaran kes dikarine dengê xwe dijî karbidestên XWE bilind bikin. Lê divê neyête bîra kirin ku ûşta ango sedema peydakirina çekan li ser hîmê aborî hatiye avakirin. Aboriya ku berjewendiya gelemper nede ber çavan,mêtinkariyê di xwe de vedişêre, mêtinkarî jî bi tenê dikare li ser çîn û gelên jar,qels û bindest were bikaranîn. Bi kurtî hatina aşitiyê, li nav rakirina çekan,tenê dikare li ser reya rizgariya welatan, azadî û serxwebûna gelan pêk were. Ger na dê her wek di kevnariya dîroka merovan de ristik û dûzanên xwezayiyê (tebîetê) werin bikaranîn. Dê her ên jar û qels

www.arsivakurdi.org

bibin nêçîra yên bi hêz û jîrek! Divê di rojên nêzîk de gelên cîhanê serwextî vê rastiyê bibin. Ger na rakirina zînat, mêtinkarî û pêşvebirina dezgehên nûjen (modern) tucaran nikarin werin pêkanîn.

Hevalên hêja!

Herçend ku pêkhatina aşitî di navbera gelên serdest de dijî gelên bindest tête xûyanîkirin jî, divê jibo dannasîna van rastiyên jorîn, gelên bindest jî di vê tevgera aşitî de hevpar bin, piştgîriya vê tevgerê bikin... Tevgerên dij-çekdarî, tevgera dij-emperyalîzm û dij-mêtingehkariyê di xwe de vedişêrin. Ev tevgera raste-rast dij-emperyalîzm û dij-mêtinkarî ye. Ev e deqên hevpar,divê gelên bindest pêwestiyên xwe di vê tevgerê de deq bi deq bi cî bihênin... Dûrbîr bin, jîr bin û bikaribin di nav gelên serdest de heval û dostan peyda bikin...

Mêvanên bi rêz!

Heval û hogirên hêja!

-Doza me rizgariya Kurdistan e,

-Xebata me têkoşîna azadî û serxwebûna gelê Kurd e,

-Ramana me welatparêzî ye!

Rizgariya Kurdistan, azadî û serxwebûna gelê Kurd daxwaza her Kurdekî dilsoz e. Evana nîşan û mercên pêkhatina wekheviya hemû gelan e. Evana bingehê rûmet,serbilindî û serfiraziya merovan e...

Herçend ku ev pirsana gelekî ronak û bi rastiyê hatine dagirtin jî, cî anîn û pêkanîna van doz û daxwazan ne hêsan û gengaz e. Ne gengaz e, jiber ku hêzên leşkerî, hêzên dewlemendî û pêşveçûna çek û dezgehên nûjen û newek-

www.arsivakurdi.org

heviya wan di nav gelan de rewşeke girêkorkî peyda kiriye. Gelên serdest di kefteleftiya serdestiya xwe de ne, gelên dewlemend,di têkoşîna paraztin û zêdekirina dewlemendiya xwe de ne... Berjewendiya (menfeet) kes, an jî ya gelan di nav sînoran de teye dîtin, berjewendiya gelemper (umumî) nayête ber çavan.. Ta ku ev cenga domdar be,dê her cenga gelên bindest jî ji bo serdestî û serxwebûnê domdar be..

Birayên delal,

Kurd dibêjin: "Dilê tirsok sînga gewrê nabîne"! Ev gotina bav û kalan havila serpêhatiyên gelekî dûr û dirêj in.Xwebêja ango maneya vê gotinê gelekî kûr e. Rast e, merovê tirsonek tucaran nikare bigêhe rûmet û serfiraziya xwe,tucaran nikare baweriya xwe bi hêza xwe bihêne, nikare bibe xwenas û vîndar, dê her çav li destê xelkê be, peyatî û xulamiya xelkê bike. Gelên bindest jî ji kesan pêk tên,gava pêşeng, berpirsiyar û karbidestên wan nikaribin bi mil û giyan xwe bidin ser reya gel, dê ew gel jî her bindest û sernizm bimîne..

Hevalên hêja!

Em mêraniyê û bêvaciyê ango ehmaqiyê jihev cuda dikin. Mêranî ne ew e ku merov bi koreyî biçe ser neyar, divê serwextî rewş û bûyeran be, jîr bilive, bikaribe hêza xwe û ya neyaran jî bi ser û bin bipîve! Bav û kalên me bi belaşî negotine "Lingên xwe qasî berra xwe dirêj bike"! Divê ev herdu gotinana li nik hev werin bikaranîn. Divê evana bibin bingehê rêzanî û têkoşîna gelên bindest. Heşaşî û serberdayiyê ango anarşîjmê ta niha kesek an jî gelên bin-

www.arsivakurdi.org

dest negîhandine armanc û serdestiyê. Tucaran li ser wê reyê dost û heval nehatine serhev û nehatine peyda kirin, bi vacayî bûne ûşta dûrketina dost û hevalan, û wendakirina baweriya gel... Bê bawerî û piştgîriya gel jî tucaran rêzanî (siyaset) û cenga serxwebûnê nikare were ajotin. Bê hebûna dost û hevalan,tucaran rêxistin an jî saziyek (partî) nikare bigêhe armanc û serdestiya xwe..

Birayên hêja û dilal,

Welatparêzî ramana me ye. Ev ramana ango îdeolojiya pîroz di van salên dawîn de gelekî bi çewtî hate belavkirin û pêşkeşkirin. Welatparêzên Kurd bi "Nijadperestiyê" hatin navandin û gelek gotinên kirêt û bêrûmet dijî wan hatin gotin. Lê gava em bala xwe berdidin ferhengan, bi taybetî (bilhassa) ferhengên ji welatên şêwrewî ango sosyalîst, em dibînin ku giranbihabûna welatparêziyê hatiye pejirandin û dijberên wê jî bi destbirakiya emperyalîstan hatine navandin! Welatparêzî: Li nik evîndariya,hezkirina welêt û gelê xwe, naskirin û piştgîriya serxwebûn û azadiya gelên din e jî. Serwextbûna, an jî nasîna pêwestiyên (wazife) xwe ji bo çarenûsa gel û welêt û amadebûna parêzgeriya wan e..

Di vir de gelekî vekirî têtе xûyanîkirin ku ew kesê welatparêz (yurtsever) divê berjewendiya ango menfeeta gel û welatê xwe ji berjewendiya xwe bilindtir bigre, bi hezkirinek germ, bi vîn (irade) û xwenasî (bilinç) ji bo azadî û serxwebûna gelê xwe keftelefteke ango têkoşîneke bêhempa bide. Li ba wê xebata xwe jî divê tucaran hebûna gelên din, mafên wan yên azadî û serxwebûnê jî ji bîra nebe.

www.arsivakurdi.org

Dûrî nijadperestiyê be. Li ser vê reyê çavên xwe ji tiştekî neparêze. Bi kurtî divê welatparêz merovperest be, parêzgeriya mafên merovî di her rewşê de bike.. Ev tiştekî xweristî ye ku, ew kesê li gelê xwe hezdike, nikare tucaran çavên xwe li hember mêtinkarî û zînata hundur û derve jî bigre, divê têkoşîna dadimendiya civakî ji xwe re bike armanc... Jiber ku gelê me bi destên neyar, mêtinkar bi zaneyî hatiye bişûndahiştin, her waha di warê her gavavêtineke pêş de jî ew her li dûv gelên cîran maye. Gava em bala xwe berdidin bûyerên salên dawîn, bi taybetî yên piştî 1975, em bi gengazî dibînin ku bîr û baweriyên civakî û aborî di nav xortên Kurd de, nemaze di nav xwendekaran de, dest bi cîgirtin û belavbûnê kirine. Ev bîr û baweriyên ku ji bona xortên me nûhatî bûn,bi dehan salan berî vê di nav gelên din de belavbû bûn û bi dûr û dirêjî li ser xebat hatibû kirin û têkoşîna wan jî hatibû dayîn. Ta ku lingên neyar li ser xaka Kurdistan neyêne kişandin,desthelatî û karbidestiya wan neyête helweşandin,dê em di her gavavêtinek pêşda an jî pêşverû de her li dûv wan bimînin û em nikarin bibin xwediyê serdestî, azadî û serxwebûnê. Ev jî bi tenê li ser pêkhatina sazî û rêxistinene bi hêz, yên ku bikaribin bi yekdestî dijî neyaran serî hildin û wan bavêjin derveyî sînorên welêt. Vê yekdes-

www.alsiwakurd.org

